

MELA MUHEMMED NÛRÎYÊ HECÎ ‘ÎSÊ Û MESNEWÎYÊN WÎ* (MELA MUHAMMED NURI AND HIS MASNEWIS)

Nesim SÖNMEZ**

Cahit TURĞUT***

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî

Received // Hatîn: 12.01.2022

Accepted // Pejirandin: 15.03. 2022

Published // Weşandin: 30.04.2022

Pages // Rûpel: 1-18

DOI: 10.55106/kurdiname.1056617

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Sönmez, Nesim û Turğut, Cahit (2022). Mela Muhemmed Nûrîyê Hecî ‘Îsê Û Mesnewîyên Wî, *Kurdiname*, no. 5, p.1-18

Plagiarism/Întihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêr jî aliyê 2 hakeman va hatiye nîrxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Edebîyat nîrxeke jîyana mirovahîyê ya herî ciwan û rengîn e. Hafîzeyê miletekî nîsbetî bi bal zîman û edebîyata wî va ye. Miletê bê edebîyat, li miroveke weke kerr û lal hatiye şîbandin. Ji ber ku ew gel; çanda xwe, rabirdûya xwe, xewn û xeyalên xwe, kêfxweşîyên xwe, êş û xemên xwe, bawerî û nîrxên xwe, jîyan û serborîyên xwe ne mimkûne ku bê edebîyat bi lêv bike. Di nav kurdan da ji demên berê hetanî roja îro gelek alim, hunermend û şair derketine. Mirov dibîne ku di edebîyata Kurdî ya klasîk da bi dehan helbestvanan bi berhemên xwe yê serkeftî û bedew ev tradîsyon domandine. Bêguman ev kesayet û berhem bi tevahî ji nîrxên alema mirovahîyê yê hevpar in û mîrateya hevpar a hafîzeyê însanîyetê ne.

Di vê gotarê de, piştî dayîna jîyana Molla Muhammed Nûrî ku wî di warê Edebiyata Kurdî ya Klasîk da berhemên serkeftî derxistîye holê û nasandina berhemên wî, kesayetîya wî ya edebî hatiye dahurandin.

Peyvên Sereke: Edebîyata Kurdî ya Klasîk, Helbest, Mela Muhammed Nûrî, Mi‘racîye, Mersîye.

Özet

Edebiyat, insan hayatının en genç ve en renkli değerlerindendir. Bir milletin hafızası diline ve edebiyatına bağlıdır. Edebiyatı olmayan milletler sağır ve dilsiz insanlara benzetilmiştir. Çünkü edebiyata sahip olmayan bir milletin; kendi kültürünü, tarihini, hayallerini, sevinçlerini, üzüntülerini, inanç ve değerlerini, geçmişini ve tecrübelerini ifade etmesi mümkün değildir. Ortadoğu halklarından olan Kürt milleti, eski çağlardan günümüze birçok âlim, sanatçı ve şair yetiştirmiştir. Klasik Kürt edebiyatı denilen bu edebiyat geleneği, onlarca şair tarafından yüzlerce yıldır başarılı ve güzel eserler vererek sürdürülmektedir. Bu şahsiyetler ve onların ürünleri, insanlık ailesinin ortak değerleridirler ve insanlık hafızasının ortak miraslarıdır. Bu makalede Klasik Kürt Edebiyatı sahasında başarılı eserler veren Molla Muhammed Nuri'nin hayatı aktarılıp eserleri tanıtıldıktan sonra edebi kişiliği irdelenecektir.

*Bu makale 2017 yılında Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Bilimsel Araştırma Projeleri Koordinasyon Birimi (BAP) tarafından desteklenen “Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de Mela Muhammed Nûrî û Berhemên Wî” adlı ve SYL-2017-6047 nolu projenin yayınıdır. BAP’a katkılarından dolayı teşekkür ederiz.

** Doç. Dr. Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, e mail: nesimsonmez@yyu.edu.tr, Orcid: 0000-0002-6315-6075.

*** Öğretmen, Van İl Milli Eğitim Müdürlüğü, e mail: cahitturgut1@gmail.com

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Şiir, Molla Muhammed Nûrî, Mî'racîye, Mersîye.

Abstract

Literature and poetry are both young and colorful in human life. It is the memory of a nation and the source of literature. Literature has benefited the nations of the world and the believers. Because literature is the property of a nation; It is possible to express your culture, history, dreams, dreams, thoughts, beliefs and experiences, experiences and experiences. The Kurdish people are much more educated, craftsmen and poets than other Kurdish peoples in the Middle East. Classical Kurdish literature is based on the beautiful literature, beautiful poems and beautiful works of dozens of poets. The products of these persons and things are inherited by the associates of the human family and by the memory of man.

This article is a reflection of the literary tradition and works of Molla Muhammed Nuri.

Keywords: Classical Kurdish Literature, Poetry, Mullah Muhammed Nuri, Miracle, Mercy.

Destpêk

Edebîyat heyat e û vê heyatê bi tevahîya reng û resmên xwe di edebîyatê da cihê xwe girtiye. Jiyan û mirin, hezkirin û ne hezkirin, kêfxweşî û ne kêfxweşî, hêvî û bê hêvîti, serfirazî û ne serfirazî, xweşî û xerabî, ciwanî û necamêrî bi tevahîya rengên xwe di naveroka cûrenivîsên wêjeyê da bi cih dibin. Her wisa di wêjeyê da tradîsyon û nêrînên miletan, bobelatên ku di jîyana kesan û civakan da diqewimin, problemên ku di jîyanê da derdikevin û hwd. di berhemên wêjeyî da çî bi pexşanî be çî jî bi helbestkî be cihê xwe digirin. Berhemên edebî, naveroka xwe û mîhwera xwe ji van mijaran û têgehên werdigirin. Ev xusûsiyeta hanê, wêjeyê gelekî bi qîmet û pêwîst dike. Ji ber van xusûsiyetan, tevahîya miletên cihanê xwedî edebîyat in. Eger wêjeya miletekî pêşketî be, însan dikare bibêje hem serpêhatîyên wî miletî gelek zêde ne û hem jî li ba wan jîyaneke pîralî û pîrrengî heye.

Li ba kurdan jî herwekî gelek miletên din edebîyat serkeftî ye û bi pêş ketîye. Bi taybetî jî edebîyata klasîk, ji demên berê hetanî roja îro di nav miletê kurd da gelekî berbelav e. Xusûsen di medreseyan da û di nava ehlê tesewîf û îrfanê da vê edebîyatê gelek raxbet dîtîye. Bi awayekî somut xwîya ye ku edebîyata klasîk gelek zêde di bin tesîra dînê îslamê da maye. Mirov dikare bibêje ku ji ber vê sedemê di nava kurdan da jî çand, edebîyat û gelek cureyên din, di bin tesîra hişmendîya dînê îslamê û îrfanîyê da mane. Gelek şair û alimên kurdan di tarîxê da bi şî'rên xwe, bi dîwanên xwe û bi berhemên xwe yên din di vê qadê da cihê xwe girtine.

Di edebîyat klasîk a kurdî da bi hejmareke tîr û tijî mesnewî hatine nivîsîn. Li gorî agahiyên niha di destê me da hene yekem mesnewî ya kurdî “Mem û Zîn” a Ehmedê Xanî ye. Ji bilî wê “Leyla û Mecnûn” a Siwadî, “Yusif û Zuleyxa” ya Selîmê Silêmanî (Selîmê Hîzanî), “Mewlûd” a Mela Huseynê Bateyî, “Nehcu'l-Enam” a Mela Xelîlê Sêrtî, “Rewdetu'n-Ne'îm” a Şêx Evdîrehmanê Axtepi, “Sîyera Cenabê Pêxember” a Mela Nurullahê Kodîşkî, Leyla û Mecnûn” a Şêx Muhemed Can û hwd meriv dikare wek mînakên mesnewîyên kurmançî rêz bike (Sönmez, 2020: 79).

Me jî di vê gotarê da Mela Muhammed Nûrî û Mesnewî yê wî ku ew xelekekî ji wêjeya kurdî ya klasîk in kir babeta vekolînê. Mela Nûrî, bi salan li gundên ku girêdayî bi bajarê Dîyarbekirê va ne melatî û seydatî kirîye. Li gor encama vekolînê me, çar berhemên wî peyda kirin. Wexta mirov van her çar berhemên dixwîne û dinirxîne dibîne ku ev her çar berhem jî bi şîklê mesnewîyê hatine nivîsîn.

1. MELA MUHEMMED NÛRÎYÊ HECÎ ÎSÊ

1.1. Jîyana Wî

Mela Muhammed Nûrîyê Hecî Îsê di tarîxa 01.07.1894an da li gundê Sinan a navçeya Bismila

Diyarbekirê hatiye dinyayê. Li gor helbestên Mela Nûrî û malbata wî, ew ji nesla Ehlê Beytê ne yanê seyîd in. Navê bavê wî Mela Ebdullah e û navê diya wî jî Fatma Xanim e.

Mela Nûrî jî malbateke malmela ye, bi taybetî diya wî him di malbatê da û him jî di nav gel da wekê “Şêx Fatma” hatiye bi nav kirin. Piştî wefata Fatma Xanimê, gora wê wekî zîyaretgahê tê zîyaretkirin. Li gor şecereya malbatê ya ku li cem birayê wî Mela Mi’az e eslê wan jî bajarê Kûfeyê hatiye Mûsilê, ji wir jî hatiye Cizîra Botan, Zaxo, Şîrwanê û herî dawîyê jî hatiye li gundê Qadîyayê (Yeşilkonak) bi cih û war bûye. Gundê Qadîyayê girêdayî bi navçeya Qûbîna (Beşîrî) bajarê Êlihê (Batman) ye. Piştî demekê malba, hatiye li hinek gundên girêdayî bi navçeya Silîvanê û pişt ra jî li bajarê Êlihê û Dîyarbekirê bi cih bûye. Malbat, wê demê li wan deveran jîyana xwe domandîye û hinek kesên malbatê jî li wan devdoran melatî û muderîstî kirine.

Mela Nûrî li gundê Sinanê li cem bavê xwe Mela Ebdullahî dest bi xwendinê dike. Ji ber ku di zaroktiya wî da bavê wî Mela Ebdullahî çûye ber rehma Xwedê, wî li gundê Elmedînê, Qirdîlekê (Kirdîrek), Cîrzê (Taşlık), Avînayê (Sürgücü), Derîkê, Altuxerê (Altınakar), Gozelşêxê (Güzelşeyh), Elîparê (Alipınar), Madenê û li navçeya Licê perwerdeya xwe berdeyam kirîye. Piştî demekî diçe li Batmanê û li Dîyarbekrê di Mizgefta Xusrev Paşa da ji hinek ‘alim û seydayan dersê werdigire.

Mela Muhemmed Nûrî sê caran zewicîye. Cara yekem bi Medîne Xanimê ra dizewice û ji vê zewacê bi navê Muhemed Mehdî, Menûre, Asîye û Muhemed du kur û du keç dine dinyayê. Mela Nûrî piştî mirina Medîne Xanimê bi Zemzeme Xanimê ra dizewice û ji vê zewacê bi navê Lamî’a û Meryemê du keç çêdibin û piştî mirina Zemzeme Xanimê jî cara sisêyan bi Nafiye Xanimê ra dizewice û ji vê zewacê jî bi navê Minewwer û Rabîayê du keç û bi navê Muhemed, Ehmed, Cemîle, Ebdurrehîm, Ebdulmelîk û Ebdulal şeş kur hatine dinyayê. Vê gavê ji kurên Seyda bi tenê Ehmed û Ebdurrehîm (Tanyeri), ji keçên wî jî Asîye, Lamîa, Minewwer û Cemîle li heyatê ne.

Muhemmed Nûrî piştî ku xwendina xwe li cem ‘alim û seydayên herêmê xilas dike û îcazetnameya xwe ya ilmî werdigre radibe diçe li gundên Dîyarbekirê, navçeya Silîvanê û li bajarê Êlihê (Batman) melatî û seydatîyê dike. Li gundên wê deverê yên bi navê Weysîkanê Jêr (Aşağı Veysikan), Aynşa (Güvercinlik), Alîşem (Alıncak), Kurdîka (Tezgeçer), Serkalî (Sayarlar), Derwêşîyê (Hasanpınar) û li Hecî Îsê (Karpuzlu) seydatî kirîye. Mela Nûrî li gundên ku seydatî kiriye gelek feqî jî dane xwendinê. Nemaze pêncî sal li gundê Hecî Îsê melatî û muderîstî kiriye. Bi sedan keç û kur, xort û ciwan li ber destê wî fêrî Qur’anê bûne.

Di pêvajoya vekolînê da me eleqeya Mela Nûrî bi tu terîqetêkî ra tesbît nekir. Digel vê yekê ew li dijî fîkra terîqetê nebûye û têkilîya wî bi ehlê terîqetê ra jî gelek xweş bûye.

Mela Muhemmed Nûrî di sala 27.05.1977an da li gundê Hecî Îsê wefat dike û di “Goristana Ehlê Beyt”a xwe da li kêleka zîyaretgaha bi navê “Seyfulmulûk”ê tê defikirin. Gundê Hecî Îsê (Karpuzlu) kêr-zêde bi qasî 10 kîlometreyan ji Dîyarbekirê dûr e û ew dikeve başûrê bajêr. Ji ber ku Seyda gelek salan li gundê Hecî Îsê melatî û seydatî kirîye ew, bi navê Melyê Hecî Îsê jî hatiye naskirin¹.

1.2. Berhemên Wî

Mela Muhemmed Nûrî bi du zimanan yanê bi Kurdî û ‘Erebî berhem nivîsîne. Çar berhemên wî bi Kurdî ne û ew niha li ber destê me ne û tavahîya van her çar berheman jî helbest in yanê menzûm in. Destnivîsên her çar berheman jî wek defter hatine nivîsandin û li cem kurê wî yê bi navê Ehmed Tanyeri hatine parastin.

¹ Me agahîyên di derbarê jîyana Mela Muhemmed Nûrî da ji kurên wî Ehmed Tanyerî û Ebdurrehîm Tanyeri wergirtin. (Dîroka hevpeyvînê: 16.01.2019 Dîyarbekir)

1.2.1. Kitabu'l-Îsra we'l-Mî'rac (Mî'raciye)

Berhema bi navê Kitabu'l-Îsra we'l-Mî'rac 2439 malik e. Mijara berhemê bûyera Mî'racê ye. Zimanê berhemê, zimanê hêsan û herikbar e. Berhem bi naveroka xwe di edebîyata Kurdî ya klasîk da berhemek taybet e, lewra ev mijar ji aliyê kêrî helbestvanan va bi berfirehî hatiye nirxandin. Berhem, bi teşeya mesnewîyê û bi kêşê 'erûzê hatiye nivîsandin. Di mesnewîyê da "behra muteqarib" û qalibê "Fe'ûlun/Fe'ûlun/Fe'ûlun/Fe'ûl"ê hatiye emilandin. Gelek mesnewî bi vê qalibê hatine nivîsîn (Îpekten, 2015: 287). Ev qalib, qalibekî kin, herikbar û bi kar anîna wî hêsan e û îmkân dide ku helbestvan mesnewîya xwe him bi hêsanî û him jî gelek dirêj binivîsîne. Bo nimûne Şehnameya Firdewsî mesnewîyek gelek dirêje û bi vî qalibî hatiye nivîsîn. Lewra ji vê qalibê ra "Kêşeya Şehnameyê" jî hatiye gotin. Destnivîsa berhemê li cem kurê Seyda, Ehmed Tanyeri parastîye û hetanî vê gavê nehatîye çapkirin. Bo nimûne çend malik ji destpêkê û dawîya berhemê.

Berhem bi van her çar malikan destpê dîke:

"Fe'ûlun/Fe'ûlun/Fe'ûlun/Fe'ûl

. _ _ / . _ _ / . _ _ / . _

Bede'tu bi ismi'l-celalî 'ela

Bi wî Xaliqî ferş û 'erşî 'ula

Bi hemd û senai ji bo zîlcelal

Me pî ibtida kir bi 'izz û kemal

Hezaran /selat û /hezaran /selam

Li ser Eh/med û şa/hi 'alî /meqam

Digel a/l û sehbi /di wî cum/le şan

Çi an û/ çi hîn û/ çi sal û /zeman" (Mî'raciye: 1-4 /46).

Berhema Kitabu'l-Îsra we'l-Mî'rac bi van her çar malikan jî diqede:

"Digel ni'meti daimî der cinan

Xuda kir muheyya ji bû mu'minan

Mi dîtî cehîm û 'ezabî mehîn

Ji bû cumlei kafîr û muşrikîn

Nexasim le'îni Ebî Cehli dîn

Digel tabî 'î wî di narî butûn

Selat û selamî Xudayî metîn

Selat û selamî Xudayî metîn" (Mî'raciye: 2429-2432 /157).

1.2.2. Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs (Mesnewîya Hesên Cewherî)

Berhema bi navê Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs 838 malik e. Mijara berhemê pend û şîret in û Mela Muhemmed Nûrî bi wesîleya çîroka Hesên Cewherî û kurê wî 'Elî, xwestîye şîretan li xwînerên xwe bike. Zimanê berhemê, zimanê hêsan û herikbar e û têşeya wê jî mesnewî ye.

Ev berhem jî wek a dinê bi kêşa 'erûzê, bi behra muteqarib û bi qalibê "Fe'ûlun/Fe'ûlun/Fe'ûlun/Fe'ûl" ê hatîye nivîsîn. Destnivîsa berhemê li cem kurê Seyda, bi navê Ehmed Tanyerî parastîye û hetanî vê gavê nehatîye çapkirin. Bo nimûne çend malik ji destpêk û dawîya berhemê.

Berhem bi van her çar malikan destpê dîke:

"Fe'ûlun/Fe'ûlun/Fe'ûlun/Fe'ûl"

. _ _ / . _ _ / . _ _ / . _

Bi zat û /sîfatî /Xudayî/ 'ezîm

Me pî ib/tîda kir /bi qelbî/selîm

Çi hemdi /ku bîtin/ ji her ha/mîda

Muheqqeq /hemî ha/sil in bû/Xuda

Digel pur selat û selamî qebûl

Li ser seyyidî me Muhemmed resûl

Li dû wî li ser al û sehba temam

Nebît munqetî ' ta bi rûzî qiyam" (Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs: 1-4 /158)

Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs bi van malikan jî diqede:

"Wefat bû bi bal rehmeta girdigar

Hemî pê diûşan buçûk û kubar

Hilanîn bi xesl û kefen wî demi

Bela bû wefata wî der 'alemi

Bi Qur'an û dewr û d'a man li ser

Heta bû temam erbe'în serteser

Vegîran hemî tev bi kerb û hezîn

Di nîv şehri Bexda bela bû girîn" (Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs: 823-826 /192)

1.2.3. Mersîyename

Berhema bi navê Mersîyename 629 malik e. Mijara berhemê karesata ku li Kerbelayê bi serê nêvîyê Hz. Pêxember, Hz. Huseyin da hatîye ye. Ev bûyera dilsoj di tarîxa Misilmanan da xalek gelek girîng e, lewra ew bûye mijara gelek berhemên edebî û gelek helbestvanan di derheqê vê karesatê da helbest nivîsîne. Zimanê berhemê, zimanê hêsan û herikbar e û têşeya wê mesnewî ye.

Ev berhem jî bi kêşa ‘erûzê, bi behra muteqarib û bi qalibê “Fe‘ûlun/Fe‘ûlun/Fe‘ûlun/Fe‘ûl” ê hatîye nivîsîn. Destnivîsa berhemê li cem kurê Seyda, bi navê Ehmed Tanyeri parastîye û hetanî vê gavê nehatîye çapkirin. Bo nimûne çend malik ji destpêk û dawîya berhemê.

Berhem bi van her çar malikan destpê dike:

“Fe‘ûlun/Fe‘ûlun/Fe‘ûlun/Fe‘ûl

. _ _ / . _ _ / . _ _ / . _

Werin hey/werin hey/ werin guh/bidin

Ku bîjim/ ji bû we/ çi derdek /mezin

Çi hate /serî eh/li beyta/ nebî

Ji bû wan /fida bin /ummî we/ ebî

Nexasim Huseyni imam bû şehîd

Di kerb û belai Imami wehîd

Werin me'temi tev bi hevra temam

Ji bû mersiya şeh bikin ihtiram” (Me'temname: 1-4 / 193)

Berhema bi Mersîyenameyê bi van malikan jî diqede:

“Bibîje Ilahî ez im bîdedeb

Bibûre ji min tu bi fexrî ‘Ereb

Yedî xû dirîj ke bi bal girdigar

Bi diqqet du‘a ke di leyl û Nehar

Bibîje Xudaya Xudayi Xeffar

Bixefrînî min mucrimi dilxedar

Digel da û bab û we her çar bira

Di der vî cihani ji bû min çira” (Me'temname: 670-673 /223)

1.2.4. Mesnewîya Şemsedînê Tacir

Berhema bi navê Mesnewîya Şemsedînê Tacir 492 malik e. Mela Nûrî, navê her sê berhemên

navborî li ser rûpela wan ya serî bi destxeta xwe nivîsiye lê di serê vê berhemê da navê berhemê nehatiye nivîsin. Ji berhemê were tê fêmkirin ku ew neqediyaye. Delîla vê yekê jî ew e ku muelîf di binê dawîya her rûpelê da peyva taqîbkirinê yanê peyva serê rûpela ku were her daîm nivîsyê. Di destnivîsa berhemê da li binê rûpela herî dawîyê peyva “hasil” hatiye nivîsin lazim e ku rûpela ku bi peyva ‘hasil’ destpê dike hebe lê ev rûpel di destnivîsê da tune. Delîleke din jî ew e ku mijar nîvco maye yanê neqediyaye. Di dawîya her sê berhemên din da beşa duayê heye lê di vê berhemê da ev beş tune ye û ev jî delîlek e dine ku îdiaya me piştrast dike. Lazim e ev yeka jî were gotin em nizanin ku Mela Nûrî dawîya vê berhemê di ciheke din da nivîsiye an na. Em di vekolînê da rastî agahîyek bi vî rengî nehatin.

Ev berhem jî wek ên din bi kêşa ‘erûzê, lê bi behra hezecê û bi qalibê “Mef‘ûlu/Mefa ‘ilun/Fe ‘ûlun” ê hatiye nivîsin. Destnivîsa berhemê li cem kurê Seyda, bi navê Ehmed Tanyeri parastîye û hetanî vê gavê nehatiye çapkirin. Bo nimûne çend malik ji destpêk û dawîya berhemê.

Berhem bi van malikan destpê dike:

“Mef‘ûlu/Mefa ‘ilun/Fe ‘ûlun

_ _ . / . _ _ / . _ _

Da hemd û /senai gir/digarî

Bînin ji / xu ra çû wur/di carî

Hemdi te /bikîn ji bû /xu ‘adet

Bilcumle/bikîn ji bû /te ta‘et

Barî ji te ra mutî‘idar in

Bilcumle ji te umîdiwar in

Hildî ku nebîn çu huzn û xewfî

Serbestî biçîn hemî bi keyfî” (Mesnewîya Şemsedîn Tacir:1-4/224)

1.2.5. Dîwan

Em di vekolîna xwe da rastî destxeta dîwanê nehatin. Ev îddîaya malbata Mela Nûrî ye ku ew dibêjin berhemek bi vî rengî a bavê me heye lê di destê wan da jî destxeta vê berhemê tune. Li gor gotina kurê wî Ehmed Tanyeri ev berhem 120 rûpel e û helbestên tê da jî bi Kurdî ne û berhem wendaye û hetanî vê gavê nehatiye dîtin.

1.2.6. Berhemên Bi ‘Erebî

Me di serê vekolînê da jî gotibû berhemên Mela Nûrî bi du zimanî ne yanê bi kurdî û Erebî ne. Du berhemên Mela Nûrî yê erebî hene û hetanî vê gavê wek destnivîs in. Ji wan her dû berhemên yek wek îqtibas hatiye berhevkirin û nivîsin. Îhtîmal heye ku Seyda ev berhem ji xwe ra wek “Nîşe” girtibin û ev nîşe bi piranî selewat û dua nin. Mijara berhema duduyan jî fiqha mezhebê Şafî‘î ye û ew wek ‘ilmihalek hatiye amadekirin. Ev her du berhem jî hetanî vê gavê wek destnivîs mane yanê nehatine çapkirin û destnivîsên her du berhemên jî li cem kurê wî Ahmet Tanyerî hatine parastin.

2. KESAYETÎYA EDEBÎ YA MELA MUHEMMED NÛRÎYÊ HECÎ ‘ÎSÊ

Mela Nûrî di malbateke zana û malmela da mezinbûye. Wisa tê xwîyakirin ku ev atmosfera malbatê li ser jîyan, fikr û ramana muelîf tesîreke mezin çêkirîye. Mela Nûrî berê li cem bavê xwe xwendîye, li ber rehleya wî perwerde bûye û bi gelemperî ilmê xwe ji wî wergirtîye. Paşê li gelek gund û navçeyên deverê di medreseyan da xwendîye. Mîrov dema berhemên wî di ber çavan ra derbas dike bi awayekî zelal dibîne ku ew çawa di warê ilmî da şareza ye wisa jî di alîyê edebîyatê da şareza ye. Mîrov dema helbestên wî dixwîne têdigêhêje ku ew di hevoksazî û vehûnandina helbestan da gelek zêde hosta ye. Lewra eger mirovek bikaribe nêzî pênc hezar malikan helbest binivîsîne, helbet ew kes di warê huner û rewanbêjîyê da miroveke serkeftî ye. Mela Muhemmed Nûrî jî bi helbestên xwe ev yek isbat kirîye.

2.1. Zimanê Wî

Mela Muhemmed Nûrî di helbestên xwe da isbat kirîye ku ew di pêkanîna malikan da şa'irek serkeftî ye. Kesên ku ji edebîyata klasîk agahdar in ew lezet û tehmeke xweşik ji helbestên şai'rî dikarin werbigirin. Mela, gelek dibin tesîra zimanê 'Erebî û Farisî da maye. Lewra zimanê helbestên wî xwerû nîn e. Di helbestên Mela Nûrî da gelek peyv, bêje, mezmûn û ravekên 'Erebî û Farisî hatine bikaranîn. Helbestvan hinek caran bi armanca ku mijara xwe herikbartir bike û kêşa 'erûzê bê kêmasî bi kar bîne, serî li peyv û bêjeyên 'Erebî û Farisî daye û ew emilandine. Lê mirov nikare bibêje zimanê wî gelek girane bileks dikare bê gotin ku zimanê wî digel vê çendê jî gelek zelal, hêsan û herikbar e. Di helbestên wî da pirê caran malikên xurt û bi bandor derdikevin pêşberî me. Di helbestên şai'rî da bi gelemperî devoka herêma Botan û hinek caran jî peyvên herêma Behdînan û Culemêrgê serdest e. Li gor qenaeta me sedema vê yekê ew e ku şai'rî, di pêvajoya perwerdehîya xwe da di bin bandora van devoka da maye û gelek peyvên xwe ji Kurmancîya wan deveran girtîye.

Di helbestan da wisa dixwîyê ku helbestvan ji bo bikaranîna serwa û paşserwaya helbestan û ji bo lihevhatina risteyan, ji gelek herêmên cuda cuda peyv û bêje wergirtine. Bo nimûne, ji herêma Behdînan û Culemêrgê hinêk nav û lêker di helbestên şai'rî da weha derbas dibin:

“Cewab da resûlî şehî layenam

Çi hîna Xuda min bibe der meqam” (Mî'racîye: 508/68)

“Barî tu Nuceylî bed 'efû key

Der baxî ne 'îmî rû be rû key” (Mesnewîya Şemsedînê Tacîr: 29/225)

“Li nik Ummî Hanî di hicra delal

Xuda razî bit jî bi 'izz û kemal” (Mî'racîye: 55/48)

“Çukû hûn dibîjin çî eşya hebin

Bi teb 'î xû peyda ne bîsahîb in” (Mî'racîye:20/47)

“Ecel kin 'ecel em biçîn meqsedî

Ku da paşnekev emr û nehyî Xudî” (Mî'racîye:1229/104)

“*Leben bû bi te ‘mi wekî hingivîn*

Wekî wî mi nedye li rûyî zemîn” (Mî‘raciye:224/55)

“*Me hîvî heye me şefa ‘et bikey*

Di rûjî qiyame me derbazi key” (Mî‘raciye:389/63)

“*Evî dabbei kes bi zîv û bi zer*

Nikarî ku bigrit eva mu ‘teber” (Mî‘raciye:101/50)

“*Xuda go dema ez wehî kim li wî*

Ku çil sali derbaz bibit ‘umri wî” (Mî‘raciye:791/82)

“*Ji çil sali heşt sal bibûrit yeqîn*

Xû hazir bike bû Muhemmed emîn” (Mî‘raciye:792/82)

“*Hinek jî kirasi li wan kurt û teng*

Diçin tîn di nîv çarşiyî rengereg” (Mî‘raciye:1176/102)

“*Hîvî me heye feqîr û jara*

Derbazî bikey gunahikara” (Mesnewîya Şemsedînê Tacir:16/224)

Mela Muhemmed Nûrî di helbestên xwe da gelek peyv û biwêj, mezmûn û ravekên ‘Erebî û Farisî jî ‘emilandîye. Lewra edebîyata klasîk li ser hîmê fikr û ramanên berfireh û hest û xeyalên kûr ava bûye. Ji ber vê yekê helbestvan gelek caran hêz û alîkarîyê ji zimanên din jî werdigirin. Bi vî awayî ew, kûrahîyeke xurt dixwe naveroka helbestên xwe. A din, ji ber ku mijarên berheman û helbestan pirê caran dînî û îrfanî ne, ji mecbûrîyetê helbestvan têgehên dînî û îrfanî gelek zêde diemilînin. Bi vê şewazê helbestên klasîk ne tenê bi zimanekî xwemalî û xwerû ne, bîleksî vê yekê ew, bi peyvên kurdî, ‘erebî û farisî hatine nivîsîn. Lêbelê mirov bi awayekî berbiçav dikare bibêje hejmara peyvên kurdî di her çar berheman da jî pir zêde ne.

Bo nimûne hinek peyvên ‘erebî û farisî di helbestên şairî da weha hatî bi kar anîn.

“*Bi tesdîqi bawer bikin bîhenek*

Ku da we xelas ke şehî çavbelek” (Mî‘raciye: 8/46)

“*Ne ‘eqî û feraset ji bo we ebed*

Ji xeyri ‘inadî bi kîn û hesed” (Mî‘raciye:18/46)

“*Bibêje ji bo min bi lutf û kerem*

Were tu beyan ke **eya muhterem**” (Mî‘raciye:937/89)

“Xuda wê **suali** ji wan ke **yeqîn**

Di **rûzi** qiyamet hemî ecme ‘în” (Mî‘raciye:12/158)

“**Ne‘em** gotî vî hurmeta **mu‘teber**

Ji bû ra digotî hemî **serteser**” (Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs:539/180)

“Li dû her kesek çû bi **hali** xû bû

Bi şîn û biş in heta **mahi** nû” (Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs: 88/161)

“Bi lez çû heta hate Kûfe **yeqîn**

Yekayek digû bû ‘Ubeydi le ‘în” (Mî‘raciye: 390/209)

“ ‘Lewlake’ te kirye **yadigarî**

Lutf û **kerema** te bûye **carî**” (Mesnewîya Şemsedînê Tacir: 7/224)

“**Fikrî** bi dil xû nine derman

Çeşm û beseri wî şubhi baran” (Mesnewîya Şemsedînê Tacir: 101/230)

“Pur lazim ev ‘ilac **emanet**

Peyda bibitin neke xiyanet” (Mesnewîya Şemsedînê Tacir: 195/233)

2.2. Bandora Kevneşopa Medreseyan

Mela Muhammed Nûrî di medreseyan herêmê da xwendina xwe temam kirîye. Ji ber vê yekê li ser helbestvanî û nivîskarîya wî bandora tradîsyona medreseyan, terz û şêweya wan gelek zêde çêbûye. Emilandina peyvên ‘erebî û farisî ji bona vê taybetîyê mînakê berbiçav e. Mijarên dînî û şêweya helbestan jî mînaka bandora tradîsyona medreseyan e. Di destpêka berhemana da nivîsandina besmeleyê mînakên bandora kevneşopîya medreseyan ne. Mela Muhammed Nûrî di berhemên xwe da tevahîya van taybetmendîyan bi kar anîye.

Dema mirov destxetên berhemên Mela Muhammed Nûrî di ber çavan ra derbas dike ji taybetîyên tradîsyona medreseyan tişteke din jî derdikeve pêşberî me. Ew jî ev a ye ku helbestvan di berhemên xwe da li ser navê Hz. Muhammed û Ehmed xêzek kişandîye û bi ‘erebî herfa ‘eyn û mîmê nivîsandîye. (Bo nimûne binêrin li Mî‘raciye: r. 46, m: 3, 6, 7; r. 47, m: 24, 29). Ev herfên hanê kurtiya peyva “‘eleyhisselam” e û bi kurdî wateya vê peyvê “selama Xwedê li ser be” ye. Ev peyv di berhemên dînî da piştî navên pexemberan hatîye nivîsandin û vegotin.

Mela Muhammed Nûrî di berhemên xwe da li ser navên ehlê beyta pexemberî yanê li ser navê Hz.‘Elî, Hz. Fatma hwd. bi ‘erebî herfa re û ‘eynê nivîsandîye (Bo nimûne binêrin li Mî‘raciye: r. 48,

m: 56, 64). Ev herfên hanê kurteya peyva “rediyellahu ‘enh” e û ev komebêje bi kurdî wek “Xwedê jê razî be” hatiye watedarkirin. Carna jî li ser navê ehlê beyta pêxemberî bi ‘erebî herfa ra û datê nivîsandîye (Bo nimûne binêrin li Mî‘raciye: r. 153, m: 2438). Ev kurte jî tê wateya “rediyellahu ‘enhû” yê û ev komebêje jî her wisa bi kurdî wek “Xwedê jê razî be” hatiye wergerandin.

Mela Muhemmed Nûrî gelek caran jî di berhemên xwe da li cîyê navên lehengên berhemê cînav emilandîye (Bo nimûne binêrin li Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs: r. 190, 191, m, 775,191). Di tradîsyona medreseyan da di dewsa navên di malikan û di hevokan da cînav hatine emilandin û ev taybetî wek “rid‘e” hatiye binavkirin. Mîrov dikare vê peyvê (rid‘e) bi Kurdî wek “veger, vegerîn” wergerîne. Di helbestan da ev taybetî bi armanca ku her car navê lehengî neyê dubarekirin û hinek caran jî bi armanca ku qalibên ‘erûzê bêpirsgirêk werine çêkirin li cihê navan gelek caran cînav hatine emilandin.

Di berhemên Mela Nûrî da hinek caran li ser hejmarên malikan xêz hatiye kişandin û li ser wê xêzê reqema wê ya ‘erebî hatiye nivîsandin (Bo nimûne binêrin li Mî‘raciye: r. 91, m: 971, 972). Nivîskarî xwestiye ku bi vê rêbazê nehêle xwînerên berhêmê hêjmara malikan tevlihev bikin.

Şair di berhemên xwe da dema ku xwestîye mijarê biguhere yan jî dest bi mijareke cuda bike xêzek kişandiye (Bo nimûne binêrin li Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs: r. 158, m, 5,17). Di medreseyan da jî vê taybetiyê ra “serkêşe” tê gotin. Her weha Mela Nûrî li gor kevneşopîya edebiyata klasîk di helbestên xwe da mexles jî emilandîye. Şa‘ir li ser mexlesên xwe xêz kişandiye û bi ‘erebî “kunyetu’n-nazim” nivîsiye. (Bo nimûne binêrin li Mî‘raciye: r. 61, m: 340, 342; Mesnewîya Şemsedîn Tacir: r. 225, 227î m, 52,53). Di berhemên xwe da hinek caran navê xwe Nûrî jî wek mexles emilandîye û li ser vê mexlesê jî xêz kişandiye. Li wan deran bi ‘erebî “ismi’n-nazim” nivîsiye (Mî‘raciye: r. 139, m: 2014, 2016).

2.3. Bikaranîna Serwayê

Di edebiyata klasîk da ji serwayê ra deng û ji paşserwayê ra jî bi awayekî sistematîk di dawîya malikan da jî dubarekirina dengên ra tê gotin. Bi Erebi jî serwayê ra qafiye tê gotin. Wekî têgeh serwa tê wateya di dawîya malikan da yan jî di cihê ku wekî dawîya malikan tê qebûlkirin da, dubarekirina dengên ku di navbera peyvên cihêwate da derdikevine meydanê (Adak, 2013: 358-363). Di helbestê da jî herfên ku tene dubarekirin ra herfên “rewî”yê tê gotin. Hevbeşîya serwayê hewceye di koka peyvan da çêbe (Sönmez, 2018: 35).

2.3.1. Serwaya Mucerrred

Serwaya Mucerrred jî dubarekirina herfa rewîyê pêk tê, herfa rewîyê bêhereke ye û berî wê jî herfeke bihereke tê. Di alfabeya Latîni da herfa bideng berîya herfa rewîyê tê (Sönmez, 2018: 36). Mela Nûrî ev cure di helbestên xwe da weha bi kar anîye. Bo nimûne:

“Ku da hûn bizanin hemî serteser

Ji mi ‘raca Ehmed şehi mu ‘teber” (Mî‘raciye: 6/46)

“Bi tesdîqi bawer bikin bîhenek

Ku da we xelas ke şehi çavbelek” (Mî‘raciye: 8/46)

2.3.2. Serwaya Murdef

Serwaya Murdef, di xwe da herfa “rîdî”ê dihevine. Herfên rîdîfê “elîf, waw û yê” ne. Ji van hersê herfan, herfêk bêhereke ye û berîya herfa rewîyê di serwayê da dubare bibe û ev dibe serwaya murdef (Sönmez, 2018: 36). Mela Nûrî, ev cure serwa çawa di malikên jêrê da jî tê xuyakirin ku di helbestên xwe da emilandîye. Bo nimûne:

“Hinek jî ‘emel kir bi qenc û dela

Hinek jî xerabî dikir bîmecal” (Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs:11/158)

“Xuda wî suali ji wan ke yeqîn

Di rûzi qiyamet hemî ecme ‘în” (Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs:12/158)

2.3.3. Serwaya Muqeyyed

Serwaya Muqeyyed, tê wateya dubarekirina herfên hemcîns ên ku bêhereke ne û berîya herfa rewîyê tî (Sönmez, 2018: 36). Mela Nûrî, ev serwaya hanê di gelek helbestên xwe da bi kar anîye.

“Bi ‘umri xû neh sal e bî kîm û kast

Ji nav rawiya ev rivayete rast” (Mî‘raciye: 57/48)

“Ji vî der melaik hene ta bi ‘ers

Ji vî der bila ‘edd hene ta bi fers” (Mî‘raciye: 852/85)

2.3.4. Serwaya Muesses

Berîya herfa rewîyê herfeke dengdar a bihereke bê, berîya wê herfê jî herfa te’sis (elîf) bê, wê demê “serwaya muesses” çêdibe. Yanê “te’sis+daxil+rewî” bi hev re hatibe bikaranîn serwaya muesses çêdibe (Adak, 2013: 398). Hinek mînakên vê serwayê di malikên Mela Muhemmed Nûrî da weha hatine sazîkirin:

“‘Uzrî xû kirîn bu wî şikayet

Em dexli te ne bikî ‘inayet” (Mesnewîya Şemsedînê Tacir: 455/244)

“Bîsûnd û derew meqali fasid

Kesba xû dîkin bila mu ‘anid” (Mesnewîya Şemsedînê Tacir: 71/228)

2.3.5. Îltîzam

Di dawîya risteyan da ji yek rewîyan bêtir rewî hatibe bikaranîn ew dibe îltîzam. Di gelek malikan da îltîzam hatiye pêkanîn. Em ji berhemên Mela Nûrî hinek mînakên wiha bidin nîşandan:

“Gelek tî de tabût hene bî ‘eded

Di wan de hene sindiqi bî meded” (Mî‘raciye:1144/100)

“Bira ev xeberdan ji we çînebin

Ku da kes nebit tabî ‘î wî ji bin” (Mî‘raciye: 2403/156)

2.3.6. Paşserwa

Paşserwa ne cûreyekî serwayê ye. Wek tê zanîn serwa di koka peyvên li dawîya risteyên helbestan

da derbas dibe. Qertafên hemdeng û hempeywir ên li dû koka wan peyvan tî dubarekirin wek “redîf” anku “paşserwa” hatine binavkirin (Adak, 2013: 397).

“Çikû der ezel ev le ‘în muşrik e

Di kufra le ‘îni meke qet şik e” (Mî‘raciye: 1438/114)

“Kerem ke were nasihi ummeti

Bi çavi serî xû bibîn cenneti” (Mî‘raciye:2173/146)

2.3.7. Hunerên Edebî

Helbestên klasîk ji hêla ciwankariyê va yanê ji aliyê hunerên edebî va pir dewlemend in. Bi vê sedemê di helbestan da watedariyeke berfireh çêdibe. Hêz û tehma helbestan jî her wisa zêdetir dibe. Ciwankarî pisporiya helbestvan nîşanî xwîneran dide. Her wisa helbestvan, hostatîya rewanbêjî û hevoksazîya xwe bi pêkanîna hunerên edebî şênber dike. Em bikaranîna hinek sernavên hunerên edebî ji helbestên Mela Muhemmed Nûrî bidin nîşandan:

2.3.7.1. Tenasub

Tenasub, ji peyvên ku di navbera wan da ji hin aliyan va têkilî û pêwendî hebin, tê çêkirin. Peyvên ku hatine nivîsîn an jî hatine gotin, di bin babet û pêwendiyekê da tî civandin (Dilçin, 2016: 431; Sönmez, 2018: 40).

“Digel al û sehbi di wî cumle şan

Çi an û çî hîn û çî sal û zeman” (Mî‘raciye: 4/46)

2.3.7.2. Tezad

Di riste yan jî malikan da du bêjeyên ji aliyê wateyî va dijberî hevûdû bin jê ra tezat tê gotin. Dijberî hem di navbera wateyên eslî da dibe û him jî di navbera wateyên mecazî da dibe (Külekçi, 1999: 71; Dilçin, 2016: 449; Sönmez, 2018: 39)

“Li nik wî nema şey’ekî serteser

Bi desti xû bigre ne **hişk** û ne **ter**” (Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs:168/165)

“Ez im bid’ekî **tahire** bîxilaf

Eya qewmi **pîsi** bi laf û güzaf” (Mî‘raciye: 256/203)

2.3.7.3. Teşbîh

Teşbîh, bi du tiştên ku di navbera wan da ji hin aliyan va şibandin hebe tê çêkirin. Ji wan her du tiştan ê lawaz ji hin aliyan (bedewî, zîrekî, fênekî, tiralî... hwd.) va bi yê/a bihêz va tê şibandin (Sönmez, 2018: 38).

“Çukû pir ji wî hesdikim **ez** bi dil

Wekî bulbuli ‘aşiqi zati gul” (Mî‘raciye:140/52)

“Eger çî **gunahi** wa **misli** çiya

Li ber cenbî 'efwi qe nabin xuya" (Mî'raciye: 2003/138)

2.3.7.4. Teşxîs

Teşxîs, weke pêname ew e ku kesek taybetmendiyên mirovan bide tiştan û wan bi rewş û tîtalên mirovan bide nîşandan û wek mirovan raber bike. Di ciwankariyê da teşxîs, ji îstîfereyê sûd wergirtiye. Di edebîyata klasîk da teşxîs pir zêde hatiye bikaranîn (Sönmez, 2018: 37). Em çend mînakên ji malikên Mela Muhemmed Nûrî wiha bidin nîşandan:

*"Metirse **eya dabbeya şubhi gul***

***Ji qelbi xu derxe hemî derd û kul"** (Mî'raciye:154/52)*

"Îşev te li min hemî hebandin

***Kerb û kederîm hemî civandin"** (Mesnewîya Şemsedînê Tacir: 169/232)*

2.3.7.5. Întaq

Helbestvan, di helbesta xwe da dema ku heyberên ji bilî mirovan dide peyvandin di wir da hunera întaqê pêk tî. Weke tê zanîn axiftin taybetiyeke mirovan e. (Sönmez, 2018: 44). Wek mînak li jêrî di berhema Mî'raciye da Buraqa ku ji pêxember ra hatiye şandin bi pêxember ra tê axivandin:

(Buraq) :

"Kerem ke were ey şehinşahi dîn

***Suwar be li min ta biçîn ecme 'în"** (Mî'raciye:144/52)*

"Eger çi bi zahir me kir ev qusûr

***Li min negre ey şahî sade ji nûr"** (Mî'raciye:145/52)*

"Çukû 'aşiq im 'aşiqan nîne qet

***Ne 'eqî û xired zahiri wan xelet"** (Mî'raciye:146/52)*

2.3.7.6. Teraduf

Helbestvan di risteyên helbestên xwe da peyvên ku wateyên wan yek in bi kar bîne ew dibe ciwankariya teraduf. Gelek caran ev peyv bi gihaneka "û"yê hatiye çêkirin (Ocek, 2019: 102). Em hinek teradufên (hemwateyî) di helbestên Mela Muhemmed Nûrî da hatine çêkirin mînakê bidin:

*"Ji lew hûn dibêjin **seqîl û giran***

***Bi hevrazî naçin bi teb'i zeman"** (Mî'raciye: 21/47)*

"Ji Cibrîlî gotî şehî îns û can

Metirse ji vî heybetî **hîn û an"** (Mî'raciye:114/50)

2.3.7.7. Tekrîr

Di tekrîrê da, ji bo ku wate were şidandin, di nivîseke pexşanî yan jî helbestekê da dubarekirina heman peyv an jî peyv an e. (Dilçin, 2016: 542; Sönmez, 2018: 41). Ev taybetî

hem di axiftinê da hem jî dinivîsînê da hêmanekî girîng e. Di helbestan da jî ev taybetmendî gelek caran hatiye bikaranîn. Hinek mînakên vê hunerê di malikên Seyda da wiha hatine rastin:

“Werin hey werin hey werin guhbidin

Ku bîjim ji bo we çi derdek mezin” (Mî‘raciye:1/193)

“Wekî wan ji zumrûdi kesk û di sûr

Wekî wan ji istebreqi xal û mûr” (Mî‘raciye:1777/129)

2.3.7.8. Mubalexe

Ev peyva Erebi di Kurdî da tê wateya “fişal”ê. Di ciwankariyê da kesek li wekandin an jî şîroveya tiştekî gelek zêderewîyê bike mirov dikare bibêje di vir da mubalexe heye. Di mubalexeyê da tiştên ku mirov jê bawer neke û li dûrî aqilê mirovan tê dîtin û ew tiştên ku tên bilêvkirin tu caran pêk nayên (Cîhanî, 2010: 55; Sönmez, 2018: 43). Mela Muhemmed Nûrî di malikên xwe da vê ciwankariyê wek mînak wiha bi kar tîne:

“Dema tîte fikr û xiyala Nuceyl

Dibare ji çeşm û beser xûn çû seyl” (Mî‘raciye: 577/219)

“Te can û ciger li min helandî

Ser ta bi qedem te min kewandî” (Mesnewîya Şemsedînê Tacir:147/231)

2.3.7.9. Telmîh (Bîranîn)

Di hunera telmîhê da, bi bikaranîna hin peyvên ra helbestvan, bûyereke ku di rabirdûyê da hatiye jiyîn tîne bîra xwendevanan. Mîjar; menqîbe, mucîzeyên pêxemberan, efsane, evînen navdar... û hwd nin (Dilçin, 2016: 461). Bi vî awayî helbestvan bi sedema van kes û rûdanan mijara helbesta xwe bihêztir û xurttir, her wisa watedartir û berfirehtir dike. Xwîner jî hem ji helbestê çêj û tehmeke xweş werdigire, hem jî bi bi fikr û xeyala xwe va di nav rûpelên dîrokê da digere û wan kesayet û rûdanan bi bîr tîne. Hinek mînakên vê hunerê di malikên Seyda da wiha hatine rastin:

“Nekîr û digel Munkerî pur delal

Dema bîne ba min ji min kin sual” (Mî‘raciye: 1047/95)

“Ji Mûsa re gotî ‘esa hilde zû

Li behrî xe da şeq bibit zû be zû” (Mî‘raciye:1419/113)

2.3.7.10. Nîda

Di zimanê Erebi da nîda tê wateya bangkirinê. Nîda, nîşaneyê hestiyarbûna helbestvanî ye (Sönmez, 2018: 40). Helbestvan gelek caran di helbestên xwe da bang dike tişt û hêmanên ku di helbesta xwe da qala wan kirî, carna jî li gor mijara helbesta xwe bang dike Xwedê, kes û kesayetên û hwd. Ji bo pêkanîna vê hunerê daçêkên bangkirinê yên wekî “ya, ey, eya, hey” û hwd. bi kar tîne e (Dilçin, 2016: 453). Carna jî navan bi xwe bi vegotîneke bangkirî bi kar tîne. Hinek mînakên vê ciwankariyê di helbestên Seyda da wiha ne:

“Çukû hesdikim ez ji te ey resul

Hemî gûtîni te li nik min qebûl” (Mî‘raciye:1852/132)

“Rica me heye ey şehi bawefa

Di rûzî qiyamet nebînin cefa” (Mî‘raciye: 986/92)

2.3.7.11. Îstî‘are

Îstî‘are weke pêname tê wateya bi armanca şibandinê, bikaranîna peyvek di şûna peyveke din da. Ji bo ku îstî‘are çêbe hewce ye peyv di dewsa wateya xwe ya eslî da neyê bikaranîn û ne pêkan e ku peyv, di wateya xwe ya eslî da were bikaranîn û hewce ye armanca şibandinê jî hebe (Kûlekçi, 99: 46). Ev huner di axiftin û nivîsandinê da, di pexşan û helbestan da gelek caran tê çêkirin.

“Emanet bike diqqeti ey ciger

Li nik xu bigîre gelek mu ‘teber” (Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs: 48/160)

“Xuda te duxwaze eya şahidîn

Xelatek mezin wî bide te yeqîn” (Mî‘raciye: 254/56)

2.4. Mexlesên Wî

Di kevneşopîya edebîyat klasîk da helbestvan ji xwe ra mexles an jî mexlesan bi kar tîne. Lewra Mela Muhemmed Nûrî jî di helbestên xwe da ji xwe ra mexles bi kar anîne. Melayî jî di helbestên xwe da wek mexlesa “**Nûrî, Necl, Nuceyl, Neclî Ewhed**” bi kar anîye. **Necl** peyvekî ‘erebî ye, bi kurdî tê wateya “**kur/law**”î. **Nuceyl** jî peyvekî ‘erebî ye, di rêzimana ‘erebî da ji peyvên wiha re “**ismu tesxîr**” tê gotin. Bi kurdî wateya peyva **Nuceyl** “**kurik/lawik**”e. Her wisa **Neclî Ewhed** jî bi kurdî wek “**kurê êkane/yekane**” tê wergerandin. Li jêrî ji malikên Mela Muhemmed Nûrî hinek mînakên bikaranîna mexlesên wî hatine rêzkirin:

“Şefa ‘et bike Nûriyî bîmedar

Mehîle di werta gunah de tu car” (Mî‘raciye: 424/411)

“Ev Necla feqîr û pur hezîn e

Der xatimeî meded bişîne” (Mesnewîya Şemsedîn Tacir: 52/195)

“Ne bîhiş be ey Neclî jar û hezîn

Şiyar be li seyra şehinşahi dîn” (Mî‘raciye: 342/61)

“Were Neclî Ewhed were rûsiya

Ji heddi xû zîde meçe bîheya” (Kitabu Nuzhetu’n-Nufûs: 645/184)

ENCAM

Mela Muhemmed Nûrî di sala 1894an de li gundê navçeya Bismilê yê bi navê Sinanê çavên xwe li ser rûyê dunyayê vekirîye û di sala 1977an de li gundê Dîyarbekirê yê bi navê Hecî Îsê çûye ber rehma Xwedê. Mela Muhemmed Nûrî temenê xwe bi melatî û seydatîyê derbaskirîye. Mela, li paş xwe çar berhemên kurdî û du berhemên 'erebî hiştine. Heta niha di qada akademîk da li ser jîyan û kesayetîya wî ya edebî û berhemên wî xebatên gelemperî û berfireh nehatine kirin. Di dawîya vekolînê da em gihîştin van encaman:

Mela Nûrî yek ji 'alim û şa'irên edebîyata kurdî e. Seyda her çar berhemên xwe yên kurdî jî bi teşeya mesnewîyê nivîsiye û kêşa 'erûzê emilandîye. Hejmara malikên berhemên weha ne: Mi'racîye 2439 malik e, Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs 838 malik e, Mersîyename 679 malik e û Mesnewîya Şemsedînê Tacir 492 malik e.

Mela Nûrî di destnivîsên berhemên xwe da li pêşîya rûpela ewil navê berhema xwe nivîsiye û bi besmeleyê dest bi berhemên xwe kirîye. Sê berhemên wî bi vî awayî ne. Berhema çaran him bêsernav e û him jî di rûpela serî da besmele tune. Lê dîsan jî wisa tê xwîyakirin ku ew rûpel, rûpela ewil e. Lewra di van malikan da hemd û sena û pesnê Xwedê derbas dibe û di beşa dû ra da jî selat û selam lê ser pêxemberî hatine dayîn. Taybetîyeke din a berhema çaran ew e ku berhemê temam nebûye û dawîya berhemê di destnivîsê da tune. Îhtîmal heye ku berhem jî alîyê muelîfî va nehatibe temamkirin û navê berhemê nehatiye nivîsin. Ji ber vê yekê me li gor naveroka berhemê û serlehengê berhemê ev berhem wekî "Mesnewîya Şemsedînê Tacir" bi nav kirîye. Ev navê hanê li wê mesnewîyê jî hêla me va hatiye danîn.

Helbestvan di du berhemên xwe da mijarên dînî jî xwe ra kirîye mijar. Mijara berhema yekem mi'racî Hz Muhemmed e (Mi'racîye), ya din jî karesata Kerbelayê yanê kuştina Hz. Huseyîn û ehlê beyta wî û hevalbendên wî ye. Ji bilî van berhemên jorî di her du mesnewiyên din da bi saya mijara berhemên pend û şîret li xwendevanan tene kirin. Bi vê naveroka xwe va her du berhemên wî yên din (Kitabu Nuzhetu'n-Nufûs, Mesnewîya Şemsedînê Tacir) wek nesîhetname ne.

Mela Nûrî di van berhemên da gelek taybetîyên edebîyata klasîk emilandine. Bo nimûne teşeya mesnewîyê, 'erûz, malik, serwa, paşserwa, hunerên edebî, mexles, mezmûn, terkîb û hwd hinek ji van mînakên in.

Seyda kevneşopîya medreseyan jî di berhemên xwe da emilandîye. Li gel navê pêxemberî vegotina peyva 'eleyhisselam, li gel navên mezinên ehlibeytê vegotina peyva rediyellahu 'enhû mînakên bandora kevneşopîya medreseyan e. Bandora vê tradîsyonê li ser Seyda zêde çêbûye. Emilandina taybetmendîya serkêşe, rid'e û hwd jî her wisa mînakên vê bandorê ne.

Seyda di helbestên xwe da peyvên 'erebî û farisî jî gelek zêde emilandine. Di berhemên da helbestvan gelek caran di bin tesîra devoka herêma Botan û Behdînan da maye.

Me di berhemên Mela Nûrî da da bandora navdarên edebîyata kurdî ya klasîk tespît nekirin. Bi vê boneyê em dikarin bibêjin ku bi taybetî bandora hostayekî navdarên kurd li ser terza wî nehatiye pêşberî me. Bi dîtina me Seyda terzekî li gor xwe û xweser pêk anîye.

ÇAVKANÎ

ADAK, Abdurrahman (2013), *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, (çapa duyem), Îstanbul: Weş. Nûbihar.

CÎHANÎ, P. (2010), *Mem û Zîn*, Îstanbul: Weş. Nûbiharê.

DİLÇİN, Cem (2016), *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, (Çapa Yazdehem), Stembol: Weş. TDK.

- İPEKTEN, Haluk (2015), *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, İstanbul: Weş. Dergâh.
- KÜLEKÇİ, N. (1999), *Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar*, Ankara: Weş. Akçağ.
- NÛRÎ, Mela Muhemmed, *Kitabu 'l-Isra we 'l-Mi 'rac (Mi 'raciye)*, Destxet e û nehatîye çapkirin.
- NÛRÎ, Mela Muhemmed, *Kitabu Nuzhetu 'n-Nufûs (Mesnewîya Hesên Cewherî)*, Destxet e û nehatîye çapkirin.
- NÛRÎ, Mela Muhemmed, *Mesnewîya Şemsedînê Tacir*, Destxet e û nehatîye çapkirin.
- NÛRÎ, Mela Muhemmed, *Me 'temname (Mersiye name)*, Destxet e û nehatîye çapkirin.
- OCEK, Nezîr (2019), *Edebiyata Kurdî*, Wan: Weş. Sîtav.
- SÖNMEZ, N (2018), *Dîwana Şêx Muşerrefê Xînûkî-Metn&Lêkolîn*, Dîyabakir: Weş. Seyda.
- SÖNMEZ, N (2020), “Nizâmî-yi Gencevî ile Sevadî'nin Leylâ ile Mecnûn Adlı Eserlerinde ‘Nevfel Karakterinin ve Nevfelli Sahnelerin’ Karşılaştırılması”, *Mukaddime*, 11(1), ss. 74-96.
- TURĞUT, Cahit (2019), *Di Edebiyata Kurdî Ya Klasîk De Mela Muhemmed Nûrî û Berhemên Wî, Têza Mastirê, Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstîtûya Zimanên Zindî, Van*

Kovara Kurdiname'yê ya Bi Hakem û Navnetewî
International Peer-Reviewed Journal of Kurdiname
Uluslararası Hakemli Kurdiname Dergisi
(e-Journal)

Chief Editor And Publisher-Serokedîtor û Weşanger

Assoc.Prof. Osman ASLANOĞLU –Dicle University- Turkey
email: aslanogluosman@gmail.com

Editorial Board // Licneya Edîtorîyê

Assoc. Prof. Hayreddin KIZIL (Dicle University) email: hkhayreddin@gmail.com
Assoc. Prof. Hacı ÖNEN (Dicle University) email: hacionen@gmail.com
Assoc. Prof. Ahmet KIRKAN / Mardin Artuklu University email: ahmetkirkkan@gmail.com

Assistants of Editor // Alîkarên Edîtor

R. A. Resul GEYİK // Mardin Artuklu University - resulteacher@gmail.com
R.A. Betül ÇOBAN // Mardin Artuklu University - cbnbetul@gmail.com

Advisory Board // Licneya Şêwirmendîyê

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK / Mardin Artuklu University: abdurrahmanadak@gmail.com
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN / Mardin Artuklu University: tahirhan@hotmail.com
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ / Dicle University: tanriverdi21@hotmail.com
Prof. Dr. M. Edip ÇAĞMAR / Dicle University: mecagmar@hotmail.com
Prof. Dr. M. Mesut ERGİN / Dicle University: emesutergin@gmail.com
Prof. Dr. Nesim DORU / Mardin Artuklu University: nesimdoru@artuklu.edu.tr
Prof. Dr. Yadgar R. Hamadameen / Soran University: Iraq: ya@sorani.edu.iq
Prof. Dr. Carina Jahani, Uppsala University, Sweden, E-mail: carina.jahani@lingfil.uu.se
Assoc. Prof. Hayreddin KIZIL / Dicle University: hkhayreddin@gmail.com
Assoc. Prof. Zahir ERTEKİN / Bingöl University: zahirertekin@hotmail.com
Assoc. Prof. Hayrullah ACAR / Mardin Artuklu University : hayrullahacar@hotmail.com
Assoc. Prof. Ayhan TEK / Muş Alparslan University: ayhan_tek@hotmail.com
Assoc. Prof. Nesim SÖNMEZ / Van Yüzüncü Yıl University: nesimsonmez@gmail.com
Assoc. Prof. Mustafa ÖZTÜRK / Mardin Artuklu University: mustafaozturk47@gmail.com
Assoc. Prof. Mustafa ÖNCÜ / Mersin University: mistefaoncu63@hotmail.com
Assoc. Prof. Canser KARDAS / Muş Alparslan University: kardascanser@gmail.com
Assoc. Prof. Osman ASLANOĞLU / Dicle University: aslanogluosman@gmail.com
Assoc. Prof. İlyas AKMAN / Mardin Artuklu University: ilyas.akman21@gmail.com
Assoc. Prof. Ahmet GEMİ / Mardin Artuklu University : ahmetgemi04@gmail.com
Assoc. Prof. Birgül Açıkıldız / Paul Valéry Montpellier III University, birgul@acikyildiz.com
Assoc. Prof. Necat KESKİN / Mardin Artuklu University: necatkeskin@gmail.com
Assoc. Prof. Hassan Sarbaz / Kurdistan University: Sanandaj- Iran h.sarbaz@uok.ac.ir
Assoc. Prof. Mustafa ASLAN / Mardin Artuklu University: mustafaaslan@artuklu.edu.tr
Assoc. Prof. Hacı ÖNEN / Dicle University: hacionen@gmail.com
Assoc. Prof. Ahmet KIRKAN / Mardin Artuklu University: ahmetkirkkan@gmail.com
Assoc. Prof. Ercan GÜMÜŞ / Mardin Artuklu University: ercangumus1977@gmail.com
Assoc.Prof. Nurettin BELTEKİN / Mardin Artuklu University: nbeltekin@yahoo.com
Asst. Prof. Hemin Omar Ahmad AHMAD / Soran University: Irak: hemin.ahmad@sorani.edu.iq
Asst. Prof. Mehmet Emin PURÇAK / Muş Alparslan University: epurcak@hotmail.com
Asst. Prof. Yusuf BALUKEN / Yozgat Bozok University: yusufbaluken@gmail.com
Asst. Prof. İlyas SUVAĞCI / Hakkari University: ilyascembeli@gmail.com
Asst. Prof. Mehmet Rezan Ekinci / Mardin Artuklu University: merekinci@gmail.com

Asst. Prof. Zafer AÇAR /Bingöl University: zafer13acar65@gmail.com
Asst.Prof. Bakhtiyar Sajjadi / Kurdistan University: Sanandaj /Iran: bakhtiar_sadjadi@yahoo.com
Asst.Prof. Yadullah Peşadadi / Kurdistan University: Sanandaj /Iran: y.pashabadiuok.ac.ir
Asst.Prof. Arkhwan MOHAMMED OBAID - Karkuk University: Iraq: arkhwanmohammed83@uokirkuk.edu.iq
Dr. Lect.Zülküf Ergün / Mardin Artuklu University: zzweshevi@gmail.com
Dr. Hewa Salam Khalid/ Koya University: Iran: hewasalam@gmail.com
Dr. Mehmet YONAT / Mardin Artuklu University: mehmetyonat49@gmail.com
Dr. M. Şirin FİLİZ / Mardin Artuklu University: mehmetirinfiliz@gmail.com
Dr. Yakub AYKAÇ / Mardin Artuklu University: aykacyakup@gmail.com
Dr. Kenan SUBAŞI / Mardin Artuklu University: kenanenado@gmail.com
Dr. Mikail BÜLBÜL - : mikailbilbil@hotmail.com

Referee Board / Licneya Hakeman

Journal of Kurdiname uses double-blind review for research articles fulfilled by at least two reviewers.

Referee names are kept confidential.

*(Kovara Kurdinameyê ji bo nirxandina gotarên lêkolînê herî kêr "du hakemên kor" bikar tîne.
Navên hakeman tên veşartin)*

INDEX

ICI Index Copernicus, ISI, SIS, ASOS, BASE, TEI, ASI, ESJI, DRJI, Citefactor, Asian Research Index, EuroPub, Jattech, İdeonline, Google scholar, Rootingindex, Journalsdirectory, ISSN PORTAL, Advanced Science Index, IJIFACTOR, Openaire, infobase, sjifactor, Academia.

CONTACT/TÊKILÎ

Chief-Editor and Puclisher:

aslanogluosman@gmail.com


Journal :

kurdiname1@gmail.com

Website:

<https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname>

ABOUT JOURNAL



Kurdiname is a Refereed International Journal Published in Electronic

Publish period is biannual (Twice for a year)

This journal uses double-blind review

Publishing article is free for authors

The journal articles are open access for readers

Articles being controlled for plagiarism before review

All articles are licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0)

The Responsibility of the articles published in the journals belongs to the author/authors.

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

e-Journal

CONTENT - NAVEROK

Research Articles / Gotarên Lêkolînî

Rûpel

1	MELA MUHEMMED NÛRÎYÊ HECÎ 'ÎSÊ Û MESNEWÎYÊN WÎ (MELA MUHAMMED NURI AND HIS MASNEWIS) Nesim SÖNMEZ –Van Yüzüncü Yıl University-Turkey Cahit TURĞUT- Turkey	1-18
2	HALÎSÎYYE ŞEYHÎ RIZA TALABANÎ DÎVANINDA NAKŞÎ-HALÎDÎ ŞEYHLERİ (NAQSHI-KHALIDIS SHEIKHS IN THE DIVAN OF SHEIKH KHALISIYYE RIZA TALABANI) Veysel BAŞÇI-Turkey	19-43
3	DELALETÊN RENGAN DI HELBESTÊN MUEYED TEYİB DE (INDICATIONS OF COLORS IN MOYAD TAYEB'S POEMS) Biryar KAMAL OMAR - Newroz University-Kurdistan/Iraq	44-63
4	نەدەبیاتی کوردی وهک بناغهیهکی به ستانداردبوونی زمانی کوردی (KURDISH LITERATURE AS A BASIS FOR KURDISH STANDARDIZATION) Safya MUHAMMAD AHMAD- Raparin University- Kurdistan/Iraq Soran ABDULRAHMAN HAMAD- Raparin University- Kurdistan/Iraq	64-75
5	HELWEST, TÊGEHÊN TÊKILÎ WÊ Û PÎVANEKÊN HELWESTÊ (ATTITUDE, RELATED CONCEPTS AND ATTITUDE SCALES) Zafer AÇAR -Bingöl University-Turkey	76-92
6	DI KILAMÊN DENGÊJAN DE RENGVEDANA AFATÊN SIRUŞTÎ Û NEXWEŞIYAN (REFLECTIONS OF NATURAL DISASTERS AND DISEASES ON 'DENGÊJ KILAMS') Murat ÇELİK-Turkey	93-104
7	TESADÜF VE EFSANELERLE BİÇİMLENMİŞ DİYARBAKIR KALESİ (DIYARBAKIR CASTLE FORMED BY COINCIDENCE AND LEGENDS) Arafat YAZ-Turkey	105-121
8	POLITICAL HISTORY OF THE DE-FACTO KURDISTAN REGION-IRAQ مێژووی سیاسی هەریمی دیفاکتۆی کوردستان-ئێراق Zyad MUHAMMAD NURI-Charmo University- Kurdistan/Iraq	122-143

Translation Articles / Gotarên Wergerî

9	LI TIRKIYÊYÊ BAVÊ ZAL Û ASTA SERKEFTINÊ Ahmet KAN-Turkey	144-150
---	--	---------

Book Review / Nirxandina Pirtûkan

10	FOLKLORÊ MA RA ÇEND NUMÛNEY Murat BAŞARAN-Turkey	151-156
11	DIMDIM Ebubekir GÖREN -Turkey	157-159

Kovara Kurdiname'yê ya Bi Hakem û Navnetewî
International Peer-Reviewed Journal of Kurdiname
Uluslararası Hakemli Kurdiname Dergisi
(e-Journal)

Chief Editor And Publisher-Serokedîtor û Weşanger

Assoc.Prof. Osman ASLANOĞLU –Dicle University- Turkey
email: aslanogluosman@gmail.com

Editorial Board // Licneya Edîtorîyê

Assoc. Prof. Hayreddin KIZIL (Dicle University) email: hkhayreddin@gmail.com
Assoc. Prof. Hacı ÖNEN (Dicle University) email: hacionen@gmail.com
Assoc. Prof. Ahmet KIRKAN / Mardin Artuklu University email: ahmetkirkkan@gmail.com

Assistants of Editor // Alîkarên Edîtor

R. A. Resul GEYİK // Mardin Artuklu University - resulteacher@gmail.com
R.A. Betül ÇOBAN // Mardin Artuklu University - cbnbetul@gmail.com

Advisory Board // Licneya Şêwirmendîyê

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK / Mardin Artuklu University: abdurrahmanadak@gmail.com
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN / Mardin Artuklu University: tahirhan@hotmail.com
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDÎ / Dicle University: tanriverdi21@hotmail.com
Prof. Dr. M. Edip ÇAĞMAR / Dicle University: mecagmar@hotmail.com
Prof. Dr. M. Mesut ERGİN / Dicle University: emesutergin@gmail.com
Prof. Dr. Nesim DORU / Mardin Artuklu University: nesimdoru@artuklu.edu.tr
Prof. Dr. Yadgar R. Hamadameen / Soran University: Iraq: ya@SORAN.EDU.IQ
Prof. Dr. Carina Jahani, Uppsala University, Sweden, E-mail: carina.jahani@lingfil.uu.se
Assoc. Prof. Hayreddin KIZIL / Dicle University: hkhayreddin@gmail.com
Assoc. Prof. Zahir ERTEKİN / Bingöl University: zahirertekin@hotmail.com
Assoc. Prof. Hayrullah ACAR / Mardin Artuklu University : hayrullahacar@hotmail.com
Assoc. Prof. Ayhan TEK / Muş Alparslan University: ayhan_tek@hotmail.com
Assoc. Prof. Nesim SÖNMEZ / Van Yüzüncü Yıl University: nesimsonmez@gmail.com
Assoc. Prof. Mustafa ÖZTÜRK / Mardin Artuklu University: mustafaozturk47@gmail.com
Assoc. Prof. Mustafa ÖNCÜ / Mersin University: mistefaoncu63@hotmail.com
Assoc. Prof. Canser KARDAS / Muş Alparslan University: kardascanser@gmail.com
Assoc. Prof. Osman ASLANOĞLU / Dicle University: aslanogluosman@gmail.com
Assoc. Prof. İlyas AKMAN / Mardin Artuklu University: ilyas.akman21@gmail.com
Assoc. Prof. Ahmet GEMİ / Mardin Artuklu University : ahmetgemi04@gmail.com
Assoc. Prof. Birgül Açıkıldız / Paul Valéry Montpellier III University, birgul@acikyildiz.com
Assoc. Prof. Necat KESKİN / Mardin Artuklu University: necatkeskin@gmail.com
Assoc. Prof. Hassan Sarbaz / Kurdistan University: Sanandaj- Iran h.sarbaz@uok.ac.ir
Assoc. Prof. Mustafa ASLAN / Mardin Artuklu University: mustafaaslan@artuklu.edu.tr
Assoc. Prof. Hacı ÖNEN / Dicle University: hacionen@gmail.com
Assoc. Prof. Ahmet KIRKAN / Mardin Artuklu University: ahmetkirkkan@gmail.com
Assoc. Prof. Ercan GÜMÜŞ / Mardin Artuklu University: ercangumus1977@gmail.com
Assoc.Prof. Nurettin BELTEKİN / Mardin Artuklu University: nbeltekin@yahoo.com
Asst. Prof. Hemin Omar Ahmad AHMAD / Soran University: Irak: hemin.ahmad@SORAN.EDU.IQ
Asst. Prof. Mehmet Emin PURÇAK / Muş Alparslan University: epurcak@hotmail.com
Asst. Prof. Yusuf BALUKEN / Yozgat Bozok University: yusufbaluken@gmail.com
Asst. Prof. İlyas SUVAĞCI / Hakkari University: ilyascembeli@gmail.com
Asst. Prof. Mehmet Rezan Ekinci / Mardin Artuklu University: merekinci@gmail.com

Asst. Prof. Zafer AÇAR /Bingöl University: zafer13acar65@gmail.com
Asst.Prof. Bakhtiyar Sajjadi / Kurdistan University: Sanandaj /Iran: bakhtiar_sadjadi@yahoo.com
Asst.Prof. Yadullah Peşadadi / Kurdistan University: Sanandaj /Iran: y.pashabadiuok.ac.ir
Asst.Prof. Arkhwan MOHAMMED OBAID - Karkuk University: Iraq: arkhwanmohammed83@uokirkuk.edu.iq
Dr. Lect.Zülküf Ergün / Mardin Artuklu University: zzweshevi@gmail.com
Dr. Hewa Salam Khalid/ Koya University: Iran: hewasalam@gmail.com
Dr. Mehmet YONAT / Mardin Artuklu University: mehmetyonat49@gmail.com
Dr. M. Şirin FİLİZ / Mardin Artuklu University: mehmetirinfiliz@gmail.com
Dr. Yakub AYKAÇ / Mardin Artuklu University: aykacyakup@gmail.com
Dr. Kenan SUBAŞI / Mardin Artuklu University: kenanenado@gmail.com
Dr. Mikail BÜLBÜL - : mikailbilbil@hotmail.com

Referee Board / Licneya Hakeman

Journal of Kurdiname uses double-blind review for research articles fulfilled by at least two reviewers.

Referee names are kept confidential.

*(Kovara Kurdinameyê ji bo nirxandina gotarên lêkolînê herî kêr "du hakemên kor" bikar tîne.
Navên hakeman tên veşartin)*

INDEX

ICI Index Copernicus, ISI, SIS, ASOS, BASE, TEI, ASI, ESJI, DRJI, Citefactor, Asian Research Index, EuroPub, Jattech, İdeonline, Google scholar, Rootingindex, Journalsdirectory, ISSN PORTAL, Advanced Science Index, IJIFACTOR, Openaire, infobase, sjifactor, Academia.

CONTACT/TÊKILÎ

Chief-Editor and Puclisher:

aslanogluosman@gmail.com


Journal :

kurdiname1@gmail.com

Website:

<https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname>

ABOUT JOURNAL



Kurdiname is a Refereed International Journal Published in Electronic

Publish period is biannual (Twice for a year)

This journal uses double-blind review

Publishing article is free for authors

The journal articles are open access for readers

Articles being controlled for plagiarism before review

All articles are licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0)

The Responsibility of the articles published in the journals belongs to the author/authors.